



Bernameya piştevaniya ji Cih-Guhertin û danûstandina piştî bicihbûnê (SETS)

GUHERTINA XIZMETAN JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'ê

Raberkirina Piştevaniyê di bin bernameya piştevaniya ji cih-guhertin û danûstandinê piştî Bicihbûnê (Settlement Engagement and Transition Support Program) di heyama belavbûna KOVÎD-19'ê hemam wisa jibo seredaneran pêkan e. Tevî vê yekê, gengaz e ku şewaza raberkirina xizmetan li gorî şîretên fermî yên Tendurustiyê were guhertin.

Di dema niha da, gellek ji raberkiran bi awayê telefonî an Online alîkariya seredaneran dikin. Di hinek babetan da, raberkirên xizmetan derbarê mijarên awarte û anjî di rewşa nebûna derfeta raberkirina xizmetên Online da dikarin bi awayê amadeyî seredaneran bibînin.

Raberkirên xizmetan jibo seredanerên ku zimanê Inglîzî bi başî xeber nadin, ji xizmetên wergerandina devkî ya telefonî sûdê werdigirin.

Derbarê **KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahiyên bi dest bîne.**

Bernameya SETS'ê çî ye?

Bernameya piştevaniya ji Cih-Guhertin û danûstandina piştî bicihbûnê (SETS) bernameyeke neteweyî jibo dabînkirina hewcetiyan têkildarî bicihkirina koçberên xwedan-merc e. Armanca vê bernameyê baştirkirina beşdariya civakî û abûrî û alîkariya bo pêkhatina têkilliyên li nav civakê ye.

Vê bernameyê du beş hene:

- *SETS – Xizmetên seredaneran zanyariyên têkildarî Bicihkirin, Şewirîn û berevaniyê dide ber destê seredaneran û jibo bidestxistina xizmetên têkildarî wan alîkariyê dike.*
- *SETS – Derfetçêkirina Civakê* alîkariya rêxistinê û komên nû-damezirandî dike da ku ji kombûn û civînên xwe piştigiriyê werbigirin û piştrast bibin ku encamên serketî yên bicihkirinê di dirêjdemê da tên parastin.

(SETS) çi cûre xizmetan raber dike?

Raberkirên SETS'ê dikarin bi raberkirina zanyarî û şêwirîna derbarê mijarên cûrbecûr ji wan fêrkarî û perwerdehî, hêskirina hînbûna zimanê Inglîzî û bidestxistina xizmetên zimanî, karkirin, mal û mesken, babetên paqijî û rihetiyê, piştgiriya malbatî û civakî, hatûçûn, beşdariya medenî û mijarên qanûnî alîkariya te bikin.

Cûreyên çalakiyan wek mînak dikare pêkhatî ji komên têkildarî erkên li malê, bernameyên fêrkirina ajovaniyê, komên agahîder û tendurustiya jinan, derfetên jibo temrînkirina axaftina zimanê Inglîzî, kursên amadetiya karî ji wan şêwaza peydakirina kar li Australyayê, pisportiyên têkildarî hevpeyvîn û nivîsîna resûmeyê bin.

Her wiha dikare alîkariya komên civakî û berpîrsên kombûnê bike da ku piştî te di warê alîkariya bo endamên malbata xwe bigirin.

Her wiha raberkirên xizmetan dikarin te bişînin cem xizmetên din da ku di warê pirsgerêka ku tûştî wê bûyî, alîkariya te bikin.

Gelo ez xwedan-mercê wergirtina van xizmetan im?

SETS – Çalakiyên têkildarî beşa xizmetên seredaneran di heyama pênc salên destpêkê yên jiyana koçberan li Australyayê da û di komên jêrê da bo wan tê raberkirin:

- Kesên nûhatî bi riya Vîzaya Mirovdostane
- Koçberên malbatî bi pisportiya kêma zimanê Inglîzî
- Xizmên koçberan ên bi pisportî û hostetî li navçeyên gundî û navçeyên ku serdestiya ser zimanê Inglîzî kêma e
- Niştecihên ku demkî hatine bijartin (xwediyên Vîzaya Zewac û Destgirtîtiyê û kesên ser bi wan) li navçeyên gundî û navçeyên ku serdestiya ser zimanê Inglîzî kêma e.

SETS – Derfetçêkirina civak, etnikên taybet ên nû û nû-diyarbûyî berçav digire:

- Civat, berpîrsên civatê û nûnerên civatên nû diyarbûyî, û
- Rêxistinên bi derfeta hevkarîya sînordar.

Ez çawa dikarin derbarê xizmetên SETS'ê agahiyên zêdetir bi dest bixim?

Jibo peydakirina raberkirên SETS'ê li navçeya jiyana xwe, ji kerema xwe serdana [vir](#) bike û lînka têkildarî lîsteya raberkirên xizmetan veke. Dema ku te raberkira xizmetan a navçeya xwe peyda kir, ji kerema xwe jibo peydakirina malpera raberkir li Înternetê bigere. Raberkirên SETS'ê, zanyariyên têkildarî baştirîn şêwaza têkiliya bi wan ra li ser malpera xwe nivîsandine.